

Pirsa jinê weke pirseke
mirovî û nîştimanî ye..

»»» R:9



Hermana hizrên bilind

»»» R:3

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyayasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (425) 06-07-2022 Buha (1000) Tumen

Pûşper jî wek Newrozê, referan-
doma serxwebûna

»»» R:7

Mirovatî û
demokrasiya sexte

»»» R:8

Raxistina ferşê sor bo terorîstan

Di heyama rojên derbasbûyî de nûçeya hatina gorê ya gelaleyekê ji aliyê dewleta Biljîkê li derheq veguherîna tawanbaran di navbera Biljîk û Îran, Hisdûstan û Îmaratê de, bûye rojeva behs û xwaştan, gelaleyek ku komek nerizayetî û nîgeranî, bitaybet ji aliyê hêza opozîsyonên rejîma Tehranê ve li pey xwe aniye. Kovara Polîtîk di vê derheqê de nivîsiye ku, di demekê li parlamena Biljîkê de ev gelaleya hat behs kirin ku, rêberên welatên Ewropayê tîsra bilindbûna nirxan ket nav dilê wan de, û bi bê ji berçav grîtina pîrensîpên mafê mirovî, meyla wan bona çareserkirina peywendiyên wan digel Îranê û çareserkirina pîrsgirêkan digel rejîma Îslamî gihîştin bi kupkê.

Yek ji wan kesan ku egera pesenkirina wî bo radeştîkirina wî bo welatê xwe tê encam dan, Esedula Esedî, bi nav dîplomat û terorîstê Îranê ye ku, li Pûşpera sala 1397'an de, bi tawana hewldan bo danîna bombeyê di civîneke Saziya Mucahidînê Xelq li Firansayê hat desteserkirin û dadgeha



welatê Biljîkê jî bi 20 sal heps ceza da.

Li hember rasdestî kirina Esedî bo Tehranê, welatê Biljîkê jî du welatîyên ve ku li Tehranê hatine desteserkirin azad dike, ev mijara siyasî ya Biljîkê digel rejîma Îslamî virda girîngî heye ku, herçawan rêzdar Mîstefa Hicrî Lêpirsyarê Gîştî yê PDKÎ di hevpeyvîneke televîzyonî de behs dike, derfeta encamdana kiryarên terorîstî ji aliyê rejîma Îslamî ve li welatên Ewropayê zêdetir dike û terorîstên Tehranê dest vekirî dihêle bo hewlên terorîstî yên wan, bi awayek fermîbûn dane bi çalakîyên terorîstî yên rejîma Îranê li Ewropayê de.

Hevdem komîteya PDKÎ ya li Biljîkê, Partiya Çep ya Îran(Fedayên Xeliq),

Komarîxwzên Sikolar, û Demokratên Îranê li Biljîkê, di nameyeke hevpar de li rêkevtî 4'ê Tîrmehê bo parlamena welatê Biljîkê nîgeraniya xwe li derheq hebûna peywendiyê digel encamên piştî bi yasakirina vê gelaleyê nîşan dan û hişdarî dan ku di pesenkirina gelaleya îşare pê hatî kirin de destê teroroîzma rejîma Îslamî a Îranê bo encamdana opere-sayona terorîstî, netenê lidijî opozîsyonê belkû li dijî hev welatîyên Biljîk û Ewropayê jî vekirî dihêle û ewlehiya Ewropayê dixîne metirsiyê. Di vê nameyê de hatiye: Nabe bê jibîr kirin ku cezayê dadgeha Mîkonosê li peywendî digel cezadana encamderên terora Mîkonosê û hespîkirina cîbicîkerên wê terorê li welatê Almaniyayê bûye sedema çêbûna rêjeyî

li heyama salên piştî terora Mîkonosê.

Kazim Darabî ku tawanbarê sereke yê terora Mîkonosê bû, di vê demê de û piştî azadbûnê bi mifah wergrtin ji cezayê girtîgreha heta hetayî û piştî derbasbûna 15 salan û zivirîna wî bo Îranê, ferşê sor bo raxistin û di asteke bilind de pêşwazî jê hat kirin û herwisa bi sedema xizmetek ku bi rejîma Îslamî kirbû, çendîn caran rêz jê hat girtin û pêgehek hikûmî ya bilind jî pê dan.

Her di vê çarçoveyê de 13 endamên Demokrat û Komarîxwaz yên Kongireya Amerîkayê di nameyekê de bo serokwezîrê Biljîkê daxwaza vê yekê kirine ku parlemena wî welatî li dijî gelaleya îşare pê hatî kirine û raweste, herwisa di nameyê de hatiye: Nabe dewleta Biljîkê ji paêrzivanên teroran re rê bide. Herwisa zêdetir ji 430 çalakvanên siyasî, civakî, kultûrî û parek ji malbatên qurbaniyên teroroîzma dewlatî ya rejîma Îslamî di ragihandinekê de, rû li siyasethanên Biljîkê hişdarî dan û gotine: Ji dewleta teroroîzmê re çiraya kesk nîşan

nedin.

Yaku zelal û xuya ye hewlên dewleta Biljîkê ye bo bi encam gi-handina vê gelaleyê ye û bi yasayîkirinê ye nekû, ji ber azadkirina barimte û wan girtiyan li Îranê de ye belkû, di rastîya hinek mî'amleyên bazirganî û komek qezencên aborî ye ku piştî vê bûyerê tên gorê. Ji aliyek din ve eger cîbicîbûna vê gelaleyê welatên Ewropayî dikarin bo heyamek zêdetir mejûlî tevgerandina samanên Îranê bin û pê bijîn û li hember de jî, çavên xwe li ser bînpêkirina mafê mirov binqînin, ku li Îran û derveyî Îranê de ku ji aliyê rejîma Îslamî a Îranê ve tên encam dan.

Yekek ji siyasethanên rejîma Îslamî a Îranê ku li rêya Spaha Pasdaran ve encam dide di rastîyê de binçavkirina hev welatîyên biyanî bi hinceta karê sîxûrîkirinê bûye ku piştî heyamekê bi wergirtina pereyek zêde an wergirtina poan li welatên rojavayî li çarçoveya peywendiyên digel cîhana derve ev azad kirine. Mixabin heta niha jî virda serkevtî bûye û Ewropayî bûne stûxwarê siyasethanên rejîmê.

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

“Ji ber xebata gelên Îranê ye ku em daxwaza nasîna mafê dana çarenivîsê li Îranê de dikin. Ev tenê rêya rakêşana xatircemî ya neteweyên zor lêkirî li Îranê de ye, ku tenê bi sedema pêkanîna yekîtiya daxwaz û peywendiya bihêz a wan e, di Îraneke azad û demokrat de.”

Dr.Qasimlo, li Xermanana sala 1349'an efsaneya M. Mekan.

Wê demê Dr. Qasimlo di ber-siva M. Mekan de wê hevokê dinivîse, Mihemedreza Şah Pehlewî di kupika desthilatê de bû û dixwest bi çar hespan ber bi eniya dervazeyên şarîstaniyet û pêşkevtinê herin. Ev Îrana ku wan druşt kiribû, li ser bingeha haşakirin li cudahiyan û hel-andina gelan di nav mencela Îrana farsîzan de! Danîbûn. Rejîma Şah hîloşiya û ev Îrana bi hatina li ser kar ya Xomeynî, parametrek din jê zêde bû, peyrewîkirin ji wilayeta Feqîh bû! Yanî mencilê ji berê zêdetir xelk dikeland û diheland, da ku wan hînî sîmaya wilayetê jî bike!

Îrana ku niha he ye, Ev Îran e ku, cudahiyan dukuje, ziman, nasname, xasî û xeyalên cuda dixeniqîne û tev bo sîmaya wilayeta Feqîh, di eniya berxwedaniya olî de xelk birçî be û bê kuştin daku Xamineyî û beyta wî û fermanderên Spah û terorîstên Hizbulah û girûpên çekdar yên girêdayî Xamineyî têr bibin. Ev Îrana ku Reza Pehlewî û Mihemedreza û piştire Xomêynî û Xamineyî jî di nav de destêverdan kirin, bingeha vê li ser zilmkarî,

Îranek din



xwînrêjî û bizorê bédengkirina damezravan e û her bi vê sedemê ye jî, ku niha di mezintirîn kirîzê de ne û gendelî û malwêraniyê seranserê wê dagirtiye, neku tirs hîloşîna rejîmê ye, belkû hîloşîna Îranê bixwe û Îranîbûnê girtiye.

Gotara Opozîsyona derveyî sînorê Îranê jî ku temaşe dikî, tenê behs li hîloşîna rejîmê nakin, belkû nîgeraniya hîloşîna Îranîbûna wan jî he ye. Ev tirs û nîgeraniya tirseke raştiye, çimkî Îranîbûna niha li ser esasa cudahîdanîn zilm û înkara damezrav û çê kirine.

Derbasbûn li rejîma Tehranê ber bi rejîmek din ve, tenê guherîna şikl û sîmayan e û hatina li ser desthilatê ya çend kesên bi navên din nabe. Çimkî bingeha vê coreyî li Îranîbûnê hejiya ye. Îranîbûnek ku tenê û tenê zilmê berhem tîne, û neteweya Fars bixwe jî li hundr de asûdebûnê nabîne, çimkî tev dewreyek neçar dibin pala xwe bidin bi dîktatorek din, heta ku neteweyên din serkut bikin û piştire jî êrîş Farsan bixwe jî digre!

Tenê Îran û Îranîbûnek dikare dewam hebe û di navxwe de aşî û vegeşînê berhem bîne, ku weke nemir Dr.Qasimlo dibêje: Cudahîdanîne havêje û pênaseya Îranê biguhere. Ev Îrana nû ya ku ava dibe, dibe meyla dixwazane ya neteweyan rabikêşe da ku, Îran pêkive bi hevparî û pênaseya wekheviyê çê bikin. Merca berdewamiya Îranê, wekheviya neteweyan di biryar standîne de ye.

Hermana hizrên bilind



N: Nûredîn Sofizade

Di gelek civak û civatgehan û di nava gelek neteweyan de, hinek kes bi hizr, raman û kiryarên xwe, dibin bingeha hizrê û dibin ramanê, û hizrên wan hinde bi bandorin ku dibin hizra vê civatgehê, yan neteweyê, di rewşeke wisa de ger rojekê ev kes bi ceşt jî bimre û jinav biçe, tu caran hizr û raman û bandora wî jinav naçe û wî kariye tovê hizr û ramana xwe di nav civatgeha xwe de biçîne û hizrên wî bo hertimî bûne hizrên gel û civatgeha wî. Îca hekî ev kes ji bilî hizrên xwe ku bandor li ser derdora xwe daniye, her bixwe jî bona pêşketin û cîbicî kirina wan hizran û bona gihîştina bi hizrên xwe ku bûne daxwaza hemî civatgehên, xebat kiribe û pêşeng û rêberê vê xebatê be, bêguman tu caran nayê jibîrkin û ev kes û hizrên xwe dibin remz û rêberê hizriya hertimî.

Renge mînakên zaf di nav gelan de hebin, lê gelê me yê Kurd jî ji kes û rêberên xwedî hizr bêpar nine. Renge ev cure kesane jî pêwer ji bona hermana hizr û ramana wan, tenê pêşengayeti û rêberbûna tevger û şoreşekî Kurdan nebe, tevî hurmet bo ked û xebata hemî rêberên tevgera rizgarîxwaziya Kurd, lê di raştî de, renga hemiyan nekarîbin bibin dahêner û xwedî hizrek ku piştî nemana wî, hizra wî bibe hizra neteweyekê.

Dr. Ebdulrehman Qasimlo mînaka bêhempaye rêberê hizrîye xebat û şoreş û gelê me ye.

Dr. Qasimlo raşte wekî zaf rêberên din, ev jî sergêr û rêberê şoreşekê bûye û li asta post û pileya kesê yekemîn



li şoreşa gelê me li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê de hebû, lê ya ku dibe sedem ku wî rêberî digel rêberên din cuda bike, tenê û tenê hizr û ramana wî rêberî ye.

Dr. Qasimlo bi hizrên bilind yên xwe, çi di serdemê berî vê ku bibe sekreter di PDKÎ de û çi serdemê xebata xwe ya piraktîk wekî bûn bi kesê yekem yê PDKÎ, û çi di asta Rojhilatê Kurdistanê û heta di Îranê de, û çi di asta Kurdistanê mezin de, bû kesekî herî xwedî bandor û hizrên bilind yê wî, wisa cihê xwe girtine ku renga heya çendîn nîşan piştî xwe her kite rêberê hizrî û bê hempa be di nav gelê xwe de.

Mezinahî û bandora hizrên Dr. Qasimlo di demekê de bo me û hemî kesê xuya dibin ku em dibînin piştî derbasbûna 33 salan bi ser şehîd bûn û nemana bi ceşeyê wî rêberê mezin, niha jî rêvîngên rêbaza wî, hizrên bêminak yên wî kirine ronahîkerê rêka xebata xwe û niha jî bingeha wê rêrew û wê rêbazê li ser wan ramanan dimeşe ku, qasimlo yê mezin danîne û kirine bingeş û xîmê xebateke ser-raşt.

Raşte Dr. Qasimlo jî wekî zaf kesên din kesê yekem di nav tevger û şoreşê bû, lê wî netenê bo serdemê deshildariya xwe, belkî bo dehan sal piştî nemana xwe jî rê û rêbazeke wisa raşt û qahîm daniye û di raştî de heya niha jî ew hizrên wî û ew siyasî û xîmê ku wî daniye, xebata hizba wî û rêvîngên wî dibe pêş. Qasimlo yê mezin bo her mijarekê hizrek hebûye ku doşt û duşman jî dizanin û

gelek cihan tê gotin ku ew gelek berî xwe dijiya. Ezê di dawiyê de amajê bi çend mînakên ji hizr û ramanên wî rêberê me yê nemir bikim ku bûne esl û bingeş û xîmê xebata me heya îro rojê.

Di demekê de ku piştî nemana Komara Kurdistanê, parek ji endamên Hizba Demokrat dixwaştin dirêjiyê bidine xebatê, lê bêserûberî û bê bernamêyî di nav wan de hebû, Dr. Qasimlo ji Ewropa wedigere Kurdistanê û dikare dawiyê bi wê bêserûberiyê bîne û şikl û rûyê organîzasyonê dide xebatê û kongirê lidar dixê û bernamê û peyrewê serdemiyane dadirêje û bernamê xebateke zelal dadinê pêşya wan xebatkarên PDKÎ, heya niha jî ev qonaxa bi qonaxa zivirandina Hizba Demokrat bo ser rêbaza eslî ya wê ji aliyê Dr. Qasimlo ve tê naskirin.

Dr. Qasimlo bû ku bo yekemîn car di dîroka xebata Kurdan de, karê girûpî û birêvebirina Hizbê bi kom û rêberiya çend endamên rêberiyê kire esleke neguher. Dr. Qasimlo bû bo yekemîn can di dîroka Kurdan de şexspereştî û tekrewî bo heçî rêberekê bi xisar û xirab zanî û bi berewajiyê hemî rêberên berî xwe û piştî xwe, dema xelkê digot bijî Qasimlo, ev acîz dibû û cehd dikir wê diroşmê û wê kulturê ji nav bibe û digot: bêjin bijî Hizba Demokrat, û bijî Kurd.

Dr. Qasimlo yekemîn rêber bû ku serbixweyîya siyasî û serbixweyî ya biryardanê di nav Hizba Demokrat û şoreşê de kire hêla sor ku hem li warê siyasî û hem dema biryardanê de nabe tu girê-

dayî bûne bi tu hêz û alî û heta dewletekê ve hebe.

Dr. Qasimlo bû ku bo yekem car kire kultureke siyasî ku di kêlega xebata neteweyî de, nabe demokrasî bibe qurbanî û ji bîr çon, em dibînin ku di germahiya şer û berxwedaniya pêşmerge de li hember hêz û hêrişê duşman de, berçav-girtina mafê mirov û reftara mirov dostane digel dîlên şer, dûr bûn ji kiryarên terorîstî û refandin û bombe dananê ji bo xebatkarên û pêşmergeyên PDKÎ re kire waneya mirov heziyê.

Dr. Qasimlo bû ku bo yekemîn car basê piştevaniya xebata neteweyî li perçên dinê ye Kurdistanê de kir, bibê tedaxul kirin û xet û nîşan danan bo xebatkarên parên dinê ye Kurdistanê.

Dr. Qasimlo bû ku exlaq di siyasî de kire bingeş û xwe paraştin ji diroşmên mezin û dûr ji raştîyê kire kultura stratejîke PDKÎ.

Dr. Qasimlo bû ku xwediyê wê hizrê bû û got: Kes nikare basê azadiyê û mafê xwe bike, ku her bixwe amade nebe bo gihîştina bi azadiyê û mafê xwe, xwe fîda bike. Dr. Qasimlo bû ku bo yekemîn car bû danerê wê hizrê ku berewajiyê daxwaza piştevaniya madî û çekan ji welatên doşt, divê daxwaza piştevaniya siyasî ji pîrsa Kurd bikin ku di vê derheqê de şoreşa Kurd û Hizba Demokrat niha jî li ser vê bingeşê hizra wî rêberê mezin peywendiya dostayetiye dikin û bitaybetî hemî dostên biyanî yên Qasimlo jî ji wê meselê bi başî tê gihîştine û ew jî heta niha, her li ser wê hizrê dostayeti û piştevaniya tevgera Kurd dikin.

Bêguman ewan û sedan hizrên dinêye Qasimloye mezin bo me rêvîngên rêbaza wî re bûne pêwer û wane bo domandina xebatê, her lew-maye ger îro rojê ew rêberê mezin bi ceşte jî di nava me de nemabe, lê dîsan jî ev heya niha jî bi hizrên xwe rêber û remz û ronahîkerê rêka xebata meye.

ji sîstema perwerde ya seqet heta bêhêvîbûna civakê



N: Sîna Qasmî

Bêhêvîbûn û nedîtina rêya rizgariyê tenê peywendî bi hejarî û bê pereyiyê nine. Dema ku malbat, qutabixane û medyakarên civakê nekarin rola xwe bi diruştî bilîzin û nekarin kar li ser diruştkirina hişyarî û danîna bingeha takek bihêz bikin, belkî hemû toyê bêhêvîbûnê belav dikin, û deşt didin deştên hev îradeya mirovan dişkênin, asayî ye ku zarok û gencên vê civakê bi diruştî neyên perwerdekirin û raştî bêhêvîbûn, nexweşiya derûnî bibin û di encamê de raştî xwekujiyê bibin.

Emê di çar beşan de behs ji rol û bandora malbat, perwerde û hînkariyê, medyakarên civakê û di dawiyê de jî behs ji amara xwekujiyê li Rojhilatê Kurdistanê bikin:

Beşa yekem: Malbat

15`ê Banemera her salê salroja cihanî ya malbatê ye ku, ji aliyê saziya navneteweyî ve hatiye diyarîkirin, malbatê rolek sereke û girîng li hîndariya civakê de heye. Lewma tê gotin ku malbat dezgeheke ji bo hînkariyê, di raştî de malbat dezgeheke nafermî ye, lê di vê warê de çalak tê hesabkirin.

Çi rêkar hene ji bo bihêzkirina bingeha malbatê:

Ji xeynî pirsgirêkên aborî û civakî, diyare endamên malbatê di civaka îroyî de bi pirsgirêka nebûna şarezayan re rû bi rû bûne. Bo mînak bêberpirsariyê, nebûna hev derdiyê, nebûna hev rengiyê, nebûna çareseriyê pirs-girêkan, nebûna peywendiya bi bandor, erênîbûna jehrîn



û... hwd.

Rêkar ji bo hemû wan pirsgirêkên ku hatinî deştnîşankirin, perwerdeya diruşt e.

Beşa duyem: Sîstema perwerde û hînkariyê

Di sîstema perwerde û hînkariya modern de pêşeroj niha ye û di sîstema perwerde û hînkariya nerîtî de niha, pêşeroj e.

Heger jiyana meriv ji deştpêka zarokatiyê ve bi başî neyê perwerdekirin û hewcehiyan bo wî/wê dabîn nekin, bêguman pêşerojek baş jî nabe. Heger bav, dayîk, malbat, civak û deştilat bixwaze pêşeroja zarokan baş bikin û îradeya wan bihêz bikin, divê ji deştpêkê ve jiyana wan ya niha baş bikin û kesayetiya wan bihêz bikin.

Azadî û ewlehiyê bo wan dabîn bikin û bi wan re dilovan bin.

Lê, di sîstema perwerde û hînkariya nerîtî de, niha pêşeroj e. bi vê wateyê ku hemû şadî, xweşî, hêvî, armanc û xwevnên zarokan dispêrine deştê pêşerojê. Mezintirîn hêviya û armanca meriv, azadî, ewlehî û dilovanî ye.

Di sîstema perwerde ya nerît de bi hinceta hindê ku meriv di pêşerojê de jiyaneke baş hebe, pêş ji azadî, asayîş û dilovaniya zarokan digrin. Dema ku zarok û ciwan heşt bi azadî, ewlehî û dilovaniyê nekin, bêguman bi başî jî nikarin bîr bikin, dahînan û şiyaneke xwe bikar bînin.

Sîstema perwerde û hînkariya Îranê ji wan sîstemên nerîtî ye, deştilat û hakimiyeta zal bi ser welatê Îranê li kêlega berjewendiyên madî û me'înewî yên deştilata siyasî ya xwe, hemû gavê dixwaze pêş ji azadî, bîrkirin û serbixweiya zarok û lawan bigre. Tevî kontrolkirina bîr û bawera zarokan ji rêya perwerdeya çandî, olî û kultura paremayî, hewl dide meriv ji zarokatî ve heşt bi xem, tirs, nîgeranî, bêhêvîbûn û bêzarî li jiyaneke bikin. Her ji deştpêkê ve wateya azadî, asayîş û dilovaniyê li zarokan têk didin.

Sîstema perwerde ya Îranê û pişkek civakê jî dixwazin zarok û law tenê wan hikayet û efsaneyan bizanin ku di berjewendiya wan de ne.

Ji rêya lêkolînên zaniştî ve derkevtiyê, 20 salên deştpêka temenê her mirovekê, bi qasî 60 sal dawiya jiyana wî/wê ye. Dema ku 20 salên deştpêka temenê mirov li ber pêşerojê bê xirabkirin, eşkereye ku 50,60 salên dawiya jiyana wî/wê jî xirab dibe.

Pirsyara cewherî eve ku, heger zarokek yan gencek heta temenê 30 saliyê di nav malbat û civakê de heşt bi azadî, ewlehî û dilovaniya xwe neke dê çawa pêşerojek baş hebe û hêvîdar be bi jiyaneke?

Beşa sêyem: Medyakarên civakê

rola medyakan di civaka îroyî de: Bêguman yek ji sebebên pêşkevtin û pêşveçûna her

civakekê vedigere bo çalakiyên medyakarên vê civakê. Civaka bê medyakar weke termê bê giyan û rih e ku ne xwedî zindîbûn û ne jî dînamîzmê ye.

Welatê Îranê yek ji wan welatên dîktator û faşîst e ku ti carî îzin nedaye ku medyakarên navxwe yê Îranê serbixwe kar bikin û azadiya derbirîne bi wan re nade. Yên dijî wan jî çalakiyan bike wan serkut dîkin û cihê wan dibe kuncê girtîgehê.

Herçawan ku min jorê jî behsa vê yekê kir ku, heger di civakekê de malbat, qutabxane û medyakar rola xwe bi başî nelîzin, dê ew civak raştî bêhêvîbûnê bê û îradeya wan dê bê şikandin. Hêvî peyvek çûk û kurt e lê, di heman demê de wateyek mezin heye. Mirov dikare bê çav bijî lê, bê hêvî na, mirovê bê hêvî wekî dara bê av e ku heger av nebe ew jî hişk dibe û dimire. Piraniya xelkê Îranê raştî bêhêvîbûnê hatine, em rojane di Kurdistanê de şahîdê xwekujî, nexweşiyên derûnî û tûşbûn bi madeyên hişber ji aliyê ciwanên Kurd in.

Beşa çaremîn û beşa dawî: Amara xwekujiyê di Rojhilatê Kurdistanê de.

Amara xwekujiya welatiyan di Îranê de ku, ji aliyê rejîma Îranê ve hatiye piştrastkirin, her sal nêzî 100 hezar kes hewla xwekujiyê didin û pitir ji 5000 kes jî di encama vê diyardeyê de canê xwe ji deşt didin. Di heyama wan çend salan de ku bêhêvîbûn gihîştîye kupikê, rêjeya xwekujiyê 8 heya %10 zêde bûye.

Pêka amara ku saziya mafê mirovî ya "Kurdpa"yê li deştpêka demsala Bihara sala 1400`an heta niha tomar kiriye bi giştî 95 welatiyan dawî bi jiyana xwe anîne (48 halet jin û 47 halet mêr). Herwisa hêjayê behsê ye ku, Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê bi piştgirêdan bi çavkanî û medyayên fermî ev amara han kom kiriye. Lê, Amara raştî zêdetir e.

Krîza mezin a gendeliyê

N: Namo

W: Agirî Enzel

Li Îranê gendelî her li dest-pêka avakirina rêkxiravên pêşkevî yên hikûmî û heta berî vê jî hebûye. Herwisa gendelî yek ji mijarên bingehîn yên nerazîbûnên xelkê di şoreşa gelan li Îranê di sala 1357'an a Rojî de bû.

Piştî derbasbûna dehka yekem a şoreşa 1357'an li Îranê û piştî şerê 8 salî yê di navber Îran û Îraqê de, hizrek li ser desthilatdarên rejîma Îranê de zal bû ku, gendeliyên îdarî weke rûn bona herdekê kirina çerxên aboriyê hesab dikirin. Tevî vê yekê jî, bernamêyên wan bona dijberîkirina li dijî gendeliyê nebû. Belkû ev desthilatdarên rejîmê li ser vê baweriyê bûn ku gendelî dikare sedema vegeşînkirina aboriya werlat dabîn bike.

kultûra gendeliyê

Dema gendelî dibe kultûr, êdî şaşbûna vê gendeliyê di civakê de bala ti kesî ra nakêş e; Lewma berfirehbûna giştî ya gendeliyê û kultûra gendeliyê bi hev re di peywendiyek tijî de ne.

Li derheq gendeliya li Îranê, divê behsa tev wan mijaran bikin yên weke: “Kultûra gendelî, gendelî û hejarî, gendelî û pêkhatiya Olî, gendelî û “Neoliberalîzm”, gendelî û kirîza regezî, neft û gendelî, zilm û gendelî, hegerên tak û civakî, gendelî û sîstema îdarî û “Bureaucracy”, gendelî û sîstema yasadaniyê, gendelî û naven-dên serweyî yasayan û herwisa gendelî digel çavkaniya derve”.

Gendeliya sîstematîk Di pênaseya gendeliya sîstematîk de divê bibêjin ku, haletê e ku wateya sîsteman girêdayî gendeliyê ye, di vê haletê de, rêkxirav, yasa û bi-haya reftaran digel gendeliyê tî hevberkirin.



bandorên gendeliyê Berfirehbûna gendeliyê li Îranê ku, ev jî şewazeke gendeliya sîstematîk e, sîstemên hikûmî xistîne qonaxa dijaretîkirin digel berjewendiyên giştî.

Ew mijar bûye sedema peydabûna mafîyayên piçûk û mezin ên aborî, herwisa bûye sedema bandor kirina li ser dewletan bona bi rê ve birina karûbaran. Ew diyardeya bûye sedema nemana baweriyê giştî li rêkxiravên hikûmî, nahikûmî û tevahiya sîstema siyasî de.

Pêka rapora Ofisa Lêkolînê Stratejîk yên serkomarê rejîma Îranê, baweriyê xelkê di nav tev civaka Îranê gihîştîye ji sedî 10 û pêwera rastgotin û destpaqijî gihîştîye ji sedî 8 ê. Di encamê de dikarin

bibêjin ku civak ber bi kev-tinek dijwar a exlaqîyê ve diçe.

Pêka rapora rêkxirava “Zelalkirina Navneteweyî”, rêzbenda Îranê li warê rohnkariya îdarî û aborî de, 3 rêzbendan daketiye û li nav 180 welatan, di rêzbenda 149'an de ye.

Gendeliya Aborî li Îranê gelek berfireh bûye, ji hekkirina malpera Wezaretê Pîşe bo kirîna tromibîlan bigire heta nebûna depoyên neftê, avakirina gundên sexete bona dest biserde girtina dariştana û revîna ji derveyî welat ve heta windabûna dekelê neftê, avakirina sexte ya gundan bo zewtkirina dariştanan û revîna bê kêmasî yên tawanbarên diziyên bi milyardan yên pere yên cur bi cur.

Yekek din ji pêwerên gendeliyê spîkirina pere ye Spîkirina pere ew prose ye ku dahata ji rêyên neyasayî ve berhem tîne, dibe pere an darayîyek xuya bi rêya yasayî bi dest hatiye û bi vê şewazî pereyê spîkirî tî nav çerxa aboriyê de.

Kesên ku karê spîkirina pere encam didin, ew kes in ku bi rêya qaçaxkirina madeyên hişber, cudakirina pere, barimte girtin û rêyên din ên neyasayî ve dahatê bi dest tînin.

Di salên derbasbûyî de, Îran û Koreya Bakûr, li listeya reş a “Girûpa taybet a hewlên malî” li rêza herî serê de cih girtine, ev yek di halekê de ye ku berpirsên rejîma Îranê soza berxwedanîkirina li hember pirsgerêka spîkirina pere dane.



Refîkê Aqûbê Îbrahîm (Mîrzoyev): Herçend ku em ji welatê bav û kalan gelekî dûr jî ketibin, me çand û hunera xwe gelekî baş parastiye.”



Min vê carê digel Refîkê Aqûbê Îbrahîm hevpeyvînek li ser rewşa ziman û çanda Kurdî li Qazaqîstanê hevpeyvîn pêk anî û wî got: Herçend ku em ji welatê bav û kalan gelekî dûr jî ketibin, me çand û hunera xwe gelekî baş.

P: Refik Mirzoyev dikare xwe hinekî bi me bide naskirin?

B: Ez Refîkê Aqûbê Îbrahîm, sala 1970yî li 10ê Nîsanê, li gundê Rihanliya Masîsa Eermenîstanê hatime dinyayê. Heta koma (pola-sinifa) 4an min li gundê Rihanliyê xwendiyê. Ji koma 4an heta koma 10an jî min li gundê Hebilkentê xwendiyê. Herdu gund jî cînarê hev bûn. Li bajarê Gence ya Azerbeycanê min deşt bi zanîngehê kir û xwendina xwe li ser çandiniyê ango zîraetê kir. Paşê beriya salên 1990î li bajarê Mînska Belarûsê ez çûm leşkeriya Artêşa Sor a Sovyeta Sosyalîst. Piştî vegera leşkeriyê, ez ketim nav Partiya Komûnîst. Malbata me sala 1990î koçî Alma Atayê kir, min hingê dixwend. Piştî ku sala 1991ê bavê min li Alma Atayê rehmê Xwedê kir, ez jî hatim Alma Atayê cem malbata xwe. Li Qazaxîstanê min xwendina xwe ya zanîngehê ya li ser çandiniyê temam kir. Piştî ez ketim nava karê bazirganiyê ango danûstandin û ticaretê û

niha jî serokatiya Enîstîtuya Mamosteyê nemir Kinyazê Îbrahîm birêve dibim û herwisa dersa zimanê Kurd jî ji zarokan re dibêjim û rojname û Kovara Kurdî jî diweşînin.

Di dema serkariya akademîsyen û profesore navdar, rehmetiyê Nadîrê Kerem (Nadîrov) de, ji sala 1999ê heta 2003yê min di Komeleya Berbangê de kar kir û Weqfa Ronahiyê vekir. Di wan salan de ez bûm endamê Berbangê û min di Berbangê de Serokatiya Kar-sazên Kurd kir. Heta roja îro jî di Berbangê de kar dikim. Ji sala 2000î heta 2012ê di parlamentoyê de min cîgirtiya parlementeriyê kir. Min ev kar bi awayeke fermî 12 salan berdewam kir. Zewicîme û du zarokên min hene.

Herwiha divê bi serbilindî bibêjim ku heta rehma Xwedê jî kir, ez herdem li kêleka apê xwe Profesore û akedemîsyen Kinyazê Îbrahîm Mîrzoyev bûm. Lê mixabin ku feleka xayîn sala par ew ji nav me bir. Lê bawer bikin ew herdem di dilê me de dijî.

P: Em hinekî behsa zimanê kurdî bikin. Kurdên Qazaxîstanê heta niha çiqasî karîne wêjeya devkî ji bo wêjeya nivîskî bikar bînin?

B: Kurdên Qazaxîstanê wekî hûn jî dizanin Kurdên Serhedê ne û 100 sal berê ji Serhedê derbasî Qefqasyayê, welatên Ermenîstan û Gurciştanê bûne. Ji ber vê yekê jî kurdiya devkî gelekî bi hosteyî bi kar tînin. Çimkî Serhed warê dengbêjî û wêjeya devkî ye. Bi sedan dengbêj ji vê herêmê derketine. Ji ber vê yekê jî, îro em heta Qazaxîstanê jî hatibin, ji welatê bav û kalan gelekî dûr jî ketibin, me çand û hunera xwe gelekî baş parastiye. Dengbêjî û wêjeya devkî di nav ne de gelekî xurt û zindî ye. Vê yekê helbet bandora xwe li wêjeya nivîskî jî kiriye. Heta niha li

Qazaxîstan û Qirgîzîstanê û berê jî li Ermenîstan û Gurciştanê gelek kitêbên kurdî derketine ku beşeke girîng ji wan bingeha xwe ji wêjeya devkî ango zargotina kurdî wergirtine.

P: Gelo wêjeya devkî ya kurdên Qezaxîstanê çiqas dewlemende û dewlemendiya wê weke xwe maye?

B: Birayê hêja bersiva vê pîrsa te, di bersiva berê de heye. Wêjeya devkî ya Kurdên Qazaxîstanê gelekî dewlemend e. Îro li seranserê Qazaxîstanê gelek gundên kurdan hene û li van gundan zimanê malê, zimanê bazarê, zimanê govend û dîlanê, zimanê şîn û şahîyan kurdî ye. Loma jî wêjeya devkî li ba me gelekî xurt e. Em herdem vê wêjeyê ango edebiyatê wekî çavê serê xwe diparêzin û bi vê yekê jî serbilind in.

P: Wêjeya devkî ya kurdên Qezaxîstanê çiqas li ser wêjeya nivîskî bibandore?

B: Gelekî bibandor e. Bêyî wêjeya devkî, wêjeya nivîskî xurt nabe. Ev herdem wisa ye. Ji bo piraniya miletan wiha ye. Miletên ku wêjeya wan a devkî xurt e, wêjeya wan a nivîskî jî xurt dibe.

P: Kekê Refik, bi awayeke giştî rewşa wêjeyê li Qazaxîstanê çawaye?

B: Li gorî baweriya min baş e. Miletê me dixwîne. Zimanê xwe, çanda xwe, wêjeya xwe bi qasî ji destan tê peyda dike û dixwîne. Hem ji kitêban tevî ku kêma in jî, hem ji helbestvan, dengbêj û çîrokbêjan, hem jî ji radyo û televîzyonên kurdî ku êdî gelekî zêde bûne, wêjeya xwe dişopîne, diaxive û heta jê tê pê dijî û belav dike.

P: Gelo heta niha we kariye ferhengeke kurdî ava bikin?

B: Ji ber ku karê ferheng-saziyê karekî gelekî mezin e, ji ber ku sazî û dezgehên

mezin û pereyêke zêde jê re divê, karekî wisa nebûye para me. Lê di wextê xwe de li Azerbaycanê Mamostê Mezin Şamil Eskerov, tevî xebatên mezin ên wêdebiyata kurdî, kar û barê ferheng-saziyê jî kiriye. Li Qazaxîstanê jî, bi qasî ku dizanim Apê min ê rehmetî, Profesore û Akademîsyen Kinyazê Îbrahîm ku li Zanîngeha Abayê dersdar û profesore bû kar û barên ferheng-saziyê di nav xebat û lêkolînên xwe de kiriye. Hêviya me ew e ku di salên pêş de xebata ferheng-saziyê di nav mamostê, şagirt û akademîsyenên me yên li Qazaxîstanê de xurtir û geştir bibin.

P: Peywendiyên we digel înstîtuyên din yên zimanî bi giştî li her çar parçeyên din ên welêt de çawaye?

B: Di dema Mamostê Kinyazê Îbrahîm de pêwendî hema bibêje bi hemû înstîtû û saziyên çandî, edebî û wêjeyî re hebûn û xurt bûn. Hêviya me ew e ku bingeha Mamostê Kinyazê di dema xwe de daniye em di demên pêş de jî berdewam bikin û xurtir bikin.

P: Ezbenî wekî pîrsa dawî, cenabê te rewşa zimanê kurdî li sernaserê welêt û li nav Qazaxîstanê çawa dibîne?

B: Çav û dilê me li welatê me ye. Her geşedana li welêt diqewime, em pê dihesin û pê serbilind dibin. Em rewşa kurdî li welêt baş dibînin û hêviyên me ji ber vê rewşê xurt in. Rewşa me jî bi rewşa welêt ve girêdayî ye. Gava rewş li wir baş be, helbet wê li ba me jî rewş baş e. Şikir îro rewşa zimanê kurdî li seranserê Qazaxîstanê, di nav kurdên me de baş e.

Birêz Refik Mîrzoyev ji bo van bersivên xweş gelekî spas, mala te ava be...

Spasxweş, mala te jî ava be. Her hebin...

Nerîna Lîderan



Emmanuel Macron:

“Em dê Îranê bînin ser rê”.



Hibtullah Axunzade:

“Talîban digel hilbijartinê nîne”.



Josep Borrell:

“Dem bo zindîkirina Bercam bi rêya siyasî kin bûye”.



Îbrahîm Reîsî:

“Zêdebûna gendelî li Îranê rêkxistinkirî û dariştî ye û bi perê dujminan tê kirin”.

Pûşper jî wek Newrozê, referandoma serxwebûna Rojhilat e!



N: Eskender Ceiferî

Rejîma Komara Îslamî a Îranê, tevgera partiyên Rojhilatê Kurdistanê bi hûrî dişopîne. Heta partiyeke Kurdî bikare hevrêziyê di nava refên aliyên cuda de pêk bîne, Komara Îslamî jî nîgeran e.

Pûşper jî weke Newrozê bûye remza şoreşê ku tê de Dr. Ebdulrehman Qasimlû ji aliyê têrorîstên Îranê ve hate têrorkirin. Di dîroka hevçerx de, ti yek ji wan desthilatan ku Kurdistan dagir kirine, nexwaştine merasîma Newrozê bi rengêkî ciddî were pêşwazîkirin. Îran jî bi heman şewaza Newrozê, li Pûşperê dinêre. Rojhilatê Kurdistanê jî parek ji vî welatê birîndar e. Komara Îslamî, weke rejîma Pehlewî, reftarê bi Kurdan re dike û lehengên Kurdan tenê ji ber pêkanîna çalakiyekê bi dehan salan di girtîgehan de dimînin.

Aliyên siyasî yên Rojhilat wate HDK û PDKÎ, herî dawî li ser pêşwazîkirin li Pûşperê dîsa dengê xwe hildan. Belkî ev, zengila metirsiyê be ji Komara Îslamî re. Ji ber ku heya niha ti caran bi vî rengî, ew du aliyên sereke yên Rojhilatê Kurdistanê li hev nêzîk nebibûn.

Piştî gotinên li ser hevgirtina wan du aliyan di Pûşpera îsal de ji aliyê wan du partiyên Kurdî ve, tevgereke mezin di nava Spaha Pasdarên Îranê de çê bûye. Ew ditirsîn vê carê Rojhilatê Kurdistanê hemû hevdeng rabe ser piyan. Zanyariyên veşartî ji nava Spahê amaje dikin ku bajarên Sine, Ormiye û Kirmaşanê bûne armanca sereke a hêzên wê rêxistina terorişt. Bi vî



rengî ku endamên Sipahê, di nava xelkê sivîl de digerin û neyaran didin nasandin û biryar e her kesê ku behsa Pûşpera hevpar a aliyên Kurdî bike, bê girtin.

Ji xeynî tevgerên Spaha Pasdaran, selefî jî li hemberî nasyonalîstan tene çalakkirin. Plana herî dawî a Îranê ew e ku derfetê bide rêxistinên tundrew da ku nasyonalîzma Kurdî di landikê de bifetisînin. Li gora zanyariyên çavkaniyeke veşartî a saziya Îstixbarat angû Îtîlaata Îranê, eger tevlihevî an jî serhildana xelkê û partiyên Rojhilat li hemberî desthilat çê be, dibe ku ji bo dijatiya hêza Kurdan, mifah ji aliyên selefî jî were wergirtin.

Her sal, hejmara kesên ku li Rojhilatê Kurdistanê di encama nebûna derfetên kar de dibin kolber, bilind dibe. Rêjeya kuştina kolberan, girtina Kurdan bi tometên siyasî û herwisa rêjeya darvekirina welatiyan zêde dibe. Tepisandina xelkê berfirehtir dibe lê dîsa jî xelk guh nade rejîmê. Her sal qedexetî dikeve ser pêkanîna rêwresma bîranîna şehîd Dr. Qasimlû lê tevî vî jî xelk rêzgirtiba xwe li wî xwe pêk tîne û slogana partiyên xwe li dijî dîktator, hildide.

Her Pûşperê, ji bo Kurdan referandûmeke serxwebûnê ye ku li dijî Tehranê li hemû navçe, gund û bajarên pêk tê. Aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê wisa dibînin ku qet li Îrana di bin desthilata Komara Îslamî de, hilbijartineke

demokratîk û azad birêve neçûye û ew hertim hilbijartinê baykot dikin. Li gor wan, her sal Kurd di Newroz û Pûşperê de du caran biryara xwe li dijî dagirker diştînin û soza xwe bi riya şehîd û cangoriyên niştîman re nû dikin.

Niha, referandûma serxwebûna Rojhilatê Kurdistanê, ji aliyê partiyên di nav Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê a Îranê ve bi rêve diçe. Her yek ji wan, sloganekê ji bo azadiya niştîman hil dide. Taktîk jî cuda ne. Lê armanca hevpar, bûye sedem da ku hemû, hevdeng, bang li neteweya Kurd bikin heya dakevin kolanan û dilê dagirker bihejînin û car din jê re bêjin ku evder welatê me ye û em ji bo pêkanîna tevgeran li ser axa xwe, îznê ji ti kesekî naxwazin û Pûşpera me, dengê dijatiya me a li hemberî dagirker e.

Êdî çiyayên Zagrosê, hemûyan dest dane hev û ji Agirî, heya Bozê Sîna, ji Kêleşîn heya Arbaba û ji Dalaho heya Qelaçolan, dengê pêşmerge di nav keç û xortên Kurd de reng vedide û ewê bi TISHK'a agir û rojê û bi tîrêjên dilên dayîkên şehîdan herin pêşwaziya Pûşperê û zêdebarî hemû rêwşûnên tund ên ewlehî ji aliyê rejîmê ve, nêzîkatiya xelkê bi mijarê re germ e û referandûma me wê di dema xwe de birêve biçe.

Mirovatî û demokrasiya sexte



N: Ebdûlazîz Qasim

Di van çend rojên borî de, carek din rûyê rasteqîn yê cîhana rojavayî û Ewropî bi zelalî hate xuyakirin û dubare aşkere dibe ku ew prensîbên bang ji bo mafên mirovan û demokrasiyê dikin ti nîrxek nîne di trazûyên berjewendiyên de, zêdetir ku heta sextekarî di raştiya bûyeran dibe û dîrok tê berovajîkirin, ev yek nedihat pêşbînîkirin ku heta ragihandina Ewropî bi taybetî ya Fransî rabe bi berojavkirina raştiyan ku ji aliyê ajansa FAP reportek li ser serdana wezîrê derve yê Îranê bo Sûriyê hatiye weşandin û di dengê Amerika de bi herdu zaravên kurmancî û Soranî li roja şemiyê 2'ê Tîrmehê hatiye weşandin û têde hatiye ku “Tirkiyê ji sala 2016an ve dest bi hejmareke êrîşan li Sûriyê kiriye ku çekdarên Kurd û herwiha çekdarên rêxistina Dewleta Îslamî (DAIŞ) û hêzên ser bi serokê Sûriyê Beşar el-Esed dikin armanc”.

Tevî hemû dizanin ku hêzên artêşa Sûriyê yên “Bişar Esed” ji aliyê Tirkiyê ve bi awayekî berfiref nehatine armanckirin, wekî dizanin ku di Sibata 2022'an de li Idlibê 37 leşkerên Tirkiyê ji aliyê hêzên rêjîma Sûriyê ve hatin kuştin û bi dihat hatin birîndarkirin bêtir ku heta Tirkiyê bersivê bide?!

Wekî din hemû dizanin rola Tirkiyê ya ji bo piştgiriya grûpên terorîst li Idlibê, Efrîn, Cebelis û Serêkaniyê, ku gelek rêberên rêxistina DAIŞ li navçeyên dagîrkeriya Tirkiyê de ji aliyê hêzên Amerîkî hatine kuştin ji wan rêberê DAIŞ Ebû Bekir El-Bexdadî di 17.10.2019'an de li nêzik serbazgeheke Tirkiyê li Idlibê, herwisa rêberê rêxistina DAIŞ yê binav Ebû



Qirşî “Ebdulla Qerdaş” li Idlibê di Sibata 2022'an de, û tevî deşeserkirina pisporê teqemeniyan û waliyê Reqayê yê rêxistina DAIŞ li Cerablîsê di 17.06.2022'an de, li vê dawiyê êrîşa “Heyat Tahrîr el-Şam” li ser Efrînê di 18.06.2022'an de, bêtir bersivê ji aliyê hêzên dagîrker ve ku “HTŞ” bi xwe beşek ji El-Qaîde ye.

Pir aşkere ye ku Tirkiyê ku “pkk” wekî hêncet bikar tîne ji bo dagîrkirina tevaya Rojavayê Kurdistanê û qirkirin û tinekirina mîletê Kurd li Sûriyê, û dagîrkeriya wê ya li ser Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê kêmîr nîne ji êrîşa niha ya Rûsya li ser Ukrayna, zêdebarî ku bi xwe piştgiriya û destekê dide rêxistinên terorîst yên herî metirsîdar yên girêdayî El Qaîde, Cebhet El-Nusra û DAIŞ'ê, û tiştê herî seyr û ecêb û dûr ji raştiyê ku çawa Tirkiyê di çapemeniya Fransa û Amerîkayê de yekser piştî îmzekirina rêkeftina sêalî di navbera Tirkiyê-Fîland-Sîwêdê de, di şev û rojekê de dibe qehreman li DAIŞ'ê?!

Mixabin di vê raporê de ya hatî bi navê “Wezîrê Derve yê Îranê ji bo aramkirina Tirkiyê serdana Sûriyê dike”, piştraşt dibe ku qedera kurdên Rojavayê Kurdistanê ketiye di destê Tirkiyê û Îranê de, zêdebarî ku Enqereyê ji Fînlanda û Swêdê, herwisa ji NATOyê bi tevayî tiştê ku dixwest bi dest xistiye û destkeftiyên xwe heta raderekê xurt bicih kirine, tevî ku Koşka Spî diyar kiriye ku Washington ji bo razîbûna bi tevlibûna Swêd û Fînlandayê di nav NATOyê de ti îmtiyazat ne-daye Enqereyê.



Pirsa jinê weke pirseke mirovî û nîştimanî ye..



N: Vênûs Fayîq

W: Hesên Mukerem

Li deştpêka serhildana tevgerên jinan û xebatên jinan li pêxema maf û azadiyên wan ji hev cuda nebûne û herwisa tevgerên siyasî û civakî û îdeolojî yên di nav civakê de jî ji hev cuda nebûne.. Bi çend peyvên din divê bêjin: Eger rûyê siyasî ve behsa her qonaxêke civakê bikin, nabe behs ji tevgera rizgarîxwazî ya jinan nekin, çimkî dîroka tevgerên jinan li her civakê de tevlikirina tev tevgerên îdolojîk yên din ku xebat bo wekhevî û azadî û mafên mirovî yên wan dîkin. Ti ciheke li vê cîhanê de şoreşek li ser sed nêran nebûye û tenê xebat bo nêran nekirine, tev şoreşên cîhanê şerên wan lipêxema tevahiya civakê bûne.


Her ji vê dîtingehê ve jî nabe xebata jinê li pêxema maf û azadiyên wan cuda li xebata neteweyan li pêxema maf û azadiyan bê temaşe kirin, herçend ku tevgerên jinan li rûyê dem û cîhên serhildana wan û şert û mercên civakê, faktorên ber bi pêşvebirina xebata wan û rola xuya ya wan di domandina di vê xebatê de û herwisa bideştveanîna deştkevt an lideşt danên wan girêdai ye.. Bilî wan faktorên kultûrî û taybetmendiyên civakî û dema şoreşan rola wan hebûye, yaku jinê kariye an nekarîbe rola mirovî ya xwe di civakê de bibîne an rûbirûyî astengiyan bûbin.. Lê, girêdana pirsê jinê di nav saziyên jinan yên girêdaiyî partîyan, piçûkkirina pirsê jinê ye, herwisa ji rêderxistina vê pirsê ye, ji ber ku dawîn car ev sazî nikarin

li çarçoveya peyrewîkirin û bernameyên partîyan derkevin, her biryarek jî partîya vê belav dike, divê ev pêka gotina vê be û ji bo vê çepikê lê bide, heta wan rexne jî nake ku çima ev partî tev mîrîn û jin havêtine perawêzê û li ştûnên girîng yên partîya vê jî û civak û deştîlatê dîr xisitne .. Êdî bi baweriya min ev jin divê berî her tiştî li dijî partiyên xwe kûditayê encam bidin û piştîre li dijî civakî..

Ez behsa serkevtin û şikeştan nakim, çimkî li siya vê şert û merca niha de civakê weke civaka Kurdistanê, evqas şikestê pêka raman û bekgirewinda hizrî û partîya xwe pênaseyê werdigrin. Bo mînak ya ku saziyek girêdayî partiyekê ku navê wê “Saziya Jinan, Afirentan, Xaniman û ...hwd” li ser xwe daniye, pêka çend û çawaniya li derheq partîya xwe nav li ser “deştkevtên” xwe dadinê. Renge bi nerîna ezekî “serbixwe” û li derveyî partiyê, eger bi “şikest”ê jî binav nekim, weke deştkevtê jî binav nakim..

Li cîhanê, piraniya tevgeran, li çarçoveya dîroka deşt nîşankirî de, rewşa şert û mercên dîrokê yên civakê bûne sedem ku serî rakirin, bo mînak li asta daxwaziyên jinan di civakê de ku xwe bi mirov pênase dike. Hertim ev saziyên ku di dîrokê de bi awayê serbixwe serîhildane û bo jinê xebat meşandine, li dîrokê de mane û bo mînak tîr vergerandin neku yên başin di nav partiyên mîran de.. Pêka vê jî bi awayek tund ev tevgerên jinan girêdane bi gunherînkariyên siyasî yên di nav civakê de.

Çimkî her çawan ku ezmûnên tal yên civakan şoreşan geşe dîkin, jin jî bi hemî şewazî û lipey du core li ezmûnên tal daxwaza mafê rewşa yên xwe dîkin ku yekemîn mafên wan weke mirov e, duyemîn weke jin e, çimkî deştîlata dagîrkerî ya dîktatoran ku zîlm ji civakê kirine, li jinê û mîran zîlm kirine, di bin vê de jî jin carek din li ser



deştê mîr tûşî corek din ji zîlmê bûye.. Li şoreşan de jin bi qasî mîr û gelek caran zêdetir îşkence û zîlm û zordarî jê hatiye kirin û heta qorbanî jî daye û bi vî awayî ku kariye yan derfet jêre hatiye dan û di bin siya mîrsalariyê de beşdarî şoreşê kiriye û herweisa di gunherînkariyan de beşdarî kiriye.

Herçend ku niha yaku jêra siyasî tîr gotin, xwe ji bazneya aborî de dibîne, tev hewl û danûstandin û lihevkerîyên siyasî bîngêhen serekeya aboriya vê deştkevt û dahat e. Her di vê barê de jî, jin biqasî mîran rol dîtine û di jiyana aborî ya civakê de beşdarî kirine, lê hertim li dawiyê de ne, an jî li perawêz xistîne. Lê, yaku wisa kiriye neku zîlm li ser jinê vîde neçe û jiyaneke kêrhatî derbas bike, belkî bi şewazeke diwartir zîlm careke din xistiye li ser wê, ya ku di civaka Kurdistanê de tev bîngêhen heştîyar û çarenivîsaz yên deştîlatê di nav civakê de ne tenê li deştê mîran de ye, bilî vê ku tev bîngêhen sereke yên aborî jî her li deştê mîran de ne, û her ev yeka jî wisa kiriye ku mafê danûstandin û biryar standinê tenê li deştê mîran de be..

Ew jinên ku di saziyên jinan de çalakin û ser bi partiyek diyarî kirîne, hebûna jinê di nav parlemen û eger tenê jinek jî be weke wezîr û hinek jin li hinek postên hikûmî de wek îzin binav dibin, di demekê de li dîtingeha taybet ya min, ev bilî xapandina jinan û hewldan bo bê dengkirina wan ti tişteke din nine. Çimkî jin di her karekê de tenê ji vê kuncikê ve temaşeyî vê dike

û dahatek dibe bo malê, lê yaku heta niha behs jê nehatiye kirin, gelo ev jina bi xasî, lêhatîbûn an mafê yasayî yê xwe wê karî encam dide? Piraniya jinan (mînakên zêde ji ber deştê min hene) ku serê mehan dahatek hedibe têxe berîka mîrê xwe.

Girêftên bîngêhen yên civaka me hişyar ye.. Belê, jin niha diçe derve, kar dike, dahata wê heye, lê encama wan jinan xwedî biryar in? Kîj ji wan jinan di nav civakê de xwediyê kesayetiya bixwe ne? Kîj kopiya kesayetiya mîrên di nav malbatê de nine? Kîj ji wan bê bêzîvirîna bo şîwêrmendiya mîrekî di nav malbatê de biryareke çarenivîsaz dîstîne. Pirsê herî girîngtir jî ev e ku bo wan mîrên ku ji warê teorî/nerîna ve baweriya wan bi rewatiya maf û daxwazkariyên jinan heye, kîjan bi tekezî daxwaza vê yekê kiriye ku pirsê jinê weke pirseke mirovî û nîştimanî pênase bike, da ku bibe daxwazkarî nek tenê jinan, belkî tevahiya civakê bi mîr û jinêan ve li vê çarçoveya dîrokê de derbixînin ku, xelk bibe bo dawîya xalên îşare bi mîrên partîyan ku tenê di helmetên hilbijartinan de di guhê xelkê de dixwînin.

Ji tev wan girîngtir jî ev e ku, carek din maf tîr daxwaz kirin, û piştî vê yekê dibe bibin li beşek girîng di nav yasayên ku di nav civakê de pê rêk dixînin, êdî ya din ku rojane li ser ekranên televîzyon û radyo û pêgeha civakan dixwînin û guhdarê wan dibin, bilî ji şer lîştok zêdetir tişteke din nabe..

»»»»doma R:9 Xebata jinê di nav civakê de eger li ser navê hizbayetiyê neyê derixsitin, tiştek wisa nayê çavnhêr kirin, divê xebata jinan û tevgera jinan di nav civakê de, li çarçoveya siyasetê jî ber bi felsefeyekê bo hişyarbûn û jiyan û îdolojîyê mirovahiyê pêngavê havêje. Çimkî ya ku îro jinek bo xwe daxwaza dike di dawiyê de bo tev jinan daxwaz dike û piştire vê jî bi xwe siyaset kiriye. Ya ku behsa siyaset û aboriyê dike nabe behsa jinê nekiribe ya neke, ev jî behsa jinê dike, wê bo bideştveanîna encamê li beşeke heştîyar a siyasetê de axavtiye. Her weke niha ku temaşeyî civaka Kurdistanê dikî, dibînî li rûyê siyasî û aborî ve li ser taxman de hatiye parvekirin, taximek

serdeşt û taximek bindeşt, di nav wan de jî ev taxma ye ku di nav tev taxmên din yê vê taxmê de carek din hatiye parvekirin û cuda kirin.. Gelek caran min jin dîtiye bi vî awayî hatiye deştibendî kirin: Li din siya deştîlata dagîrkaran de: Dagîrkar hebûye, di bin vê dagîrkariyê de jî, jin dagîrkariyê deştê mêran jî bûye.. Di vê civakê bi sedema hizir û baweriyên siyaî an îdolojî, an heta olî, pir caran jin carek din li ser deştê mêran raştî cudahî danîn û çewsandinê hatiye.. Di civakê de: Dewlemend û hejar heye, di bin vê deştibendiyê de jî hin jin hene ku xwarê mêran in.. Di jiyana siyasî de serdet hene û taxma bindeşt ev jî hene, ku pêştir jin di bin wan herdu

taxma de carek din jin di nav çarçoveya ciwankirina hizbê de hatine dor lêdan. Ji aliyê milkdariyê de jî hertim mêr xwedî milk bûye û jin parek bûye ji vê milkê ku li ser mêr hatiye tesbît kirin.. Niha pirsê herî girîng ev e ku çawa jin û xebata jinan bibin parek ji cudanebûn ji xebata mirovahiyê li pêxema demokrasiyê de ku mafên vê di civakê de bi wekhevî bo jin û mêr deştêber bin? Çawa pirsê jinê bikin bi parek cudanebûyî û parvenekirî ji xebateke siyasî li pêxema mirovahiyê de bi bê cudahî danîn û cewaziya zayendî? Çawa hebûn, eger heta yek jin jî hebe li ser rêzbandên hîlbijartinan hewcehiyek be bo civakê, ji warê kêrhatîbûn û şîyan û îmkanat ve, nek hewcehiyek be bo ciwan ki-

rîna partiyekê? Cihê mixabiniyek mezine ku, piştî derbasbûna 32 salan li ser deştîlata binav azad di Kurdistanê de, guherîkariyên li ser pirsê jinê, tenê li şikl de xwe dîtiye, ev cihê mixaniyê ye ku niha hin jin hene ku dîr ji aliyan bo partiyan nikarin serbixweya pirsê jinê xebatê bikin, cihê mixabiniyê ye ku li rûyê hejmar ve jinan û ji warê pîşeyê ve ji di nav poştan de danîne, lê li rûyê çawaniyê cihê dilxweşiyê nine.. Cihê mixabiniyê ye ku jin bixwe di nav heqîqetê de dijîn û haydarê hûrî û mezinahiya pirsê jinê û nexweşiyên û kêmasiyan in lê, partî nikarin soza axavtin ji vê pirsê bikin û serbixwe û bi bê pişguh xistina mêr û partiyan xebatê bo xwe encam bidin.

LI ROJHILATÊ KURDISTANÊ



N: Lokman Polat

Dema ku rejîma Îranê a dagirker êrişî bargehên PDKÎ yên li başûrê Kurdistanê, li Koyêsancaqê kiribû û çendî endamên PDKÎ bi sedema wê êrişê jiyana xwe ji destdan, min bi zimanê turkî hem ji bo ewê ku êrişa dewleta Îranê protesto bikim û hem raya giştî a Turkiyê û bakurê Kurdistanê hayidar bikim, min vê demê ev nivîsa xwe a li jêr di rojnameya Nûroj de weşandibû.

Min ev nivîsa xwe berê bi turkî nivîsibû û weşandibû. Niha min ev ji bo xwendevanên rojnameya Agirî ji turkî ve wergerandî ye bo ser zimanê kurdî. Nivîs dirêj bû, min kurt kir û ez pêşkêşî xwendevanên rojnameya Agirî dikim. Li gorî nûçeya BBC, radyo û televizyona Swêd û Fransî, rejîma Îranê li dijî baregehên polîtbiroya PDK'ê û çeperên Pêşmerge yê girêdayî PDKÎ'ê êrişêke dijware mûşekî pêk anîn. Li Rojhilatê Kurdistanê pitir ji 70 sal in têkoşîneke bi

rûmet tê meşandin. Dewleta Îranê ya kolonyalist di bin zulmeke hovane de, bi mekanîzmayeke îstîsmarê ya tund, bi hovîti û zulmê di serdema Şah de deştîlatdariya Rojhilatê Kurdistanê dikir. Komara Kurdistanê ku di sala 1945an de hate damezrandin, di encama îtîfaq û kompoyên di navbera emperyalîzm û dewletên herêmê de hat rûxandin.

Sovyeta bi navê Sovyeta Sosyalîst jî di wê demê de alîkariya ku soz dabû gelê Kurd û partiya wê ya pêşeng PDKÎ'ê jî soz û peymana xwe bi cih neanî û azadiya gelê Rojhilatê Kurdistanê bi çend bermîlên petrolê veguherand.

Piştî ewê ku Komara Kurdistanê ji aliyê rejîma dîktatore Şah ve têk çû, piştî li rojhilatê Kurdistanê li ser gelê kurd komkujiyêke dijwar hate kirin.

Rêveberiya olî ya paşvero ya ku piştî rûxandina rejîma Şah hat ser kar, jî êriş, zext û zilma xwe bo ser gelê Kurd heya niha jî berdewame.

Dema ku Xumeynî hêj li Parîsê bû û nehatibû Îranê û deshilat bideşt ve negirtibû, gelek soz dan ku di şerê li dijî Şah de piştgirîya Kurdan bike. Xumeynî soza "azadî"

da gelên Îranê, piştî ku Xumeynî hat ser hukim, li dijî Kurdên azadîxwaz û bi komkuji li Kurdistanê re "cîhad" îlan kir.

Her çiqas gelê Kurdistanê miletekî misilman be jî, ji deştê hikûmetên îslamî gelek êş û azar dîtine. Di dema pêşketina îslamê de, Kurdistan bi giştî raştî dagirkerî/îşgal û êrişên hêzên îslamî hat.

Celadê kurdan yê bi navê Xalxalî, dibêje: "Di Îslamê de îdam emrê Xweda ye." Li rojhilatê Kurdistanê gelek kes bê pirs îdam kirin, darve kirin. (Û hêj jî herroj li wir kurd tene darvekirin.) Nivîskarê Îranî Bahman Nîrumend li ser celadê kurdan "Xalxalî" wiha dibêje: "Xalxalî di mehkemeya vekirî de Kurdên girtî di nav çend deqeyan de mehkeme kirin, cezayê îdamê da wan û di cih de îdam kirin. Ji girtiyekî bi giranî birîndar ê ku li ser milan anîne pêşberî wî jî ne xem e. Bi alîkariya girtiyên din re dema li ser piyan disekine tê gulebarankirin... Heta wêneyên vê dîmenê jî hene ku rewşê belge dîkin." (Îran Kulîlkên Li Pişt Deriyên Hesin Dimirin - rûpel: 191.)

Li Rojhilatê Kurdistanê li dijî kolonyalîzma/dagirkeriya Farisan têkoşîneke bînavber

didome. Di vî şerê bi rûmet de û di heyamê 7 dehiyê xebat û berxwedaniyê de, heya niha Hezaran Pêşmergeyên qehreman şehîd ketine.

Hem di serdema Şah, û hem jî di dema rejîma Îslamî de, rejîma dagirker a navendî zextên cur bi cur xioştine ser gelê Kurd. Di her serdemê de xwîn, hovîti, barbarî, deştavêtin û înfaz tê kirin. Bi vî awayî pasdarên îslamî yê rejîma îslamî, kolonyalist edaleta Îslamî li Kurdistanê pêk tînin(!). Erkê her welatparêz, demokrat û azadîxwazekê ye ku piştevaniya gelê Kurd û hêzên siyasî yê pêşeng ên wî bike, ku li dijî hovîtiya rejîma Îslamî xebata rizgariyê dike.

Divê partî, rêxistin û hemû tevgerên siyasî û sîvîl yê Kurd li hemû parçeyan li dijî van êrişên rejîma Kolonyalist a Îranê dengê xwe bilind bikin.

Pêwîste hem êrişa dewleta Turk û hem jî ya dewleta Îranê ya li ser Başûrê Kurdistanê û êrişên hêzên siyasî yê welatparêz ên Kurd li dijî baregehên pêşmerge û gerîlla bînavber şermezarkirin, divê di raya giştî ya cîhanê de were eşkerekirin û bi tundî were protestokirin.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Welatîyekî xelkê Merîwanê piştî gazîkirina bo îdareya Îtla`atê hat binçavkirin

Roja Yekşemî 12ê Pûşperê welatîyekî, Kurd ê bi navê “Mehdî Resayî” yê temen 30 salî û kurê “Mame Reşe” û xelkê gundê “Serdoş”ê girêdayî bajarê Merîwanê, piştî gazîkirin bo îdareya Îtla`ata wî bajarî hat binçavkirin.

Qedera wî welatîyê Kurd piştî binçavkirinê, nerohn e û heta niha lipeyketina malbata wî bona agehdarbûn ji qedera kurê wan bê encam maye.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê ji sedema binçavkirin û tohmetên sepanî li dijî wî welatîyê Kurd ti zaniyariyek li ber deşt nîne.

Kolberekî Kurd li ser sînorê Banê hat birîndarkirin

Roja Şemî 11`ê Pûşperê, Kolberekî Kurd yê bi navê “Kemal Îbrahîmzade” xelkê gundê “Dêwlan” yê girêdayî bajarê “Serdeşt”ê bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê li ser sînorê “Bane” hat birîndarkirin.

Hêzên leşkerî bi bê agehdarkirina berê teqe ji wî Kolberê Kurd kirine.

Bi sedema teqeya hêzên leşkerî ew kolberê Kurd rûyên wî birîndar bûye û bo tedawiyên pîzîşkî bo nexweşxaneyê “Selahedîn Eyûbî” hatiye veguhestine.

“Kemal Îbrahîmzade” xêzandar û bavê du zarokan e.

Welatîyekî xelkê Merîwanê piştî gazîkirina bo îdareya Îtla`atê hat binçavkirin

Roja Yekşemî 12ê Pûşperê welatîyekî, Kurd ê bi navê “Mehdî Resayî” yê temen 30 salî û kurê “Mame Reşe” û xelkê gundê “Serdoş”ê girêdayî bajarê Merîwanê, piştî gazîkirin bo îdareya Îtla`ata wî bajarî hat binçavkirin.

Qedera wî welatîyê Kurd piştî binçavkirinê, nerohn e û heta niha lipeyketina malbata wî bona agehdarbûn ji qedera kurê wan bê encam maye.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê ji sedema binçavkirin û tohmetên sepanî li dijî wî welatîyê Kurd ti zaniyariyek li ber deşt nîne.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê, ji sedema binçavkirin û tohmetên sepanî, ti zaniyariyek li ber deşt nîne.

Welatîyekî bi temen ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin

Roja Sêşemî 7`ê Pûşperê, welatîyekî Kurd ê bi navê “Silêman Salik” temen 69 sal û xelkê bajarê Mihabadê ji aliyê hêzên ewlehî ve hatiye binçavkirin û bo cihek nexuya hatiye veguhestin.

Pêka gotina çavkaniyê agehdar hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyên yasayî ew welatîyê Kurd li ser rêya Pîranşehr-Mihabadê binçav kirine.

Herwisa wê çavkaniyê da zanîn, “malbata wî welatîyê Kurd bo agehdarbûn ji qedera “Silêman Salik” serdana navendên ewlehî li bajarê “Pîranşehrê” kirine, lê ti bersivê li peywendî digel qedera wî welatîyê wernegirtine.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê, ji sedema binçavkirin û tohmetên ku li dijî wî welatîyê Kurd hatine sepanî, ti zaniyariyek ji ber deşt nîne

Li sînorê Newsûdê bi sedema teqeya rasteraşt ya hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê kolberekî Kurd hat birîndarkirin

Roja Sêşemî 27`ê Hezîranê, kolberê Kurd yê bi navê “Efşîn Yûsfî” kurê Yûsif û xelkê bajarê Ciwanroyê, bi sedema teqeya rasteraşt ya hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê li ser sînorê Newsûdê hat birîndarkirin.

Hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê, bi bê agehdar kirina berê û di mewdayek kin de teqe ji wî kolberê Kurd kiribûn.

Ew kolberê Kurd di vê bûyerê de, piştî wî bi dijwarî birîndar bûye û heta niha pîzîşkan bona derxistina goleyên li laşê wî ketinî nekarne derbixînin.

Efşîn Yûsfî xîzandar e û ev heyama salekê ye ku jiyana hevpar pêk aniye

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (425)

QASIMLÛ

MEŞXELA HERTIM A RONÎDERÊ
ŞOREŞA KURDISTANÊ YE



DEZGEHA RAGIHANDIN A
PDKÎ